*Bidestveanîna mafên netewî yên gelê kurd di çarçoveya Îraneke demokratîk û federal de*

# Agirî

Duheftînameyek Siayasî-Giştî Ye, PDK Îranê diweşîne www.kurdistanmedia.com/kurdî

Hejmar (526)
2026-09-22

www.agirimedia.org




**DI VÊ HEJMARÊ DE:**

Daxuyaniya Desteya Kargêriya PDKÎ..2
Rojev ........................................ 7
Hevpeyvîn ................................. 8
Civakî .......................................10
Mafê Mirov ............................... 11
Poster....................................... 12

# Peyama Sikirtêrê Giştî yê Hizba Dêmokrat bi hilkefta salvegera tevgera Jînayê û mangirtina giştî ya 25ê



**Xelkê xebatkar û azadîxwaz ê Kurdistanê!**

**Xuşk û birayên min yên hêja!**

Çwar salan berî niha di roja 25ê Xermananê de, hûn xelkê ku zarokên wan hatine kuştin û mafên wan ji aliyê Komara Îslamî ve hatine binpêkirin, ku rêjimeke azadîkuj û dijî mirovahiyê ye, ji bo tolhildana xwîna bi neheqî rijandî a Jîna Emînî ku ji aliyê hêzên tepeserkare wê rejimê ve li Tehranê hat kuştin, we mangirtin û meşeke seranserî dest pê kir. Ev meş bû hewênê meşên nerazîbûnê li seranserê Îranê û hemû cîhanê û avakirina tevgera "Jin, Jiyan, Azadî" ku heta niha jî li ser zimanê Kurdan û hemû azadîxwazan e li seranserê cîhanê.

Peyama zelal a tevgera Jînayê ji bo hikûmeta sêdarê li Tehranê, nîşaneya kîn û aciziya we ya kombûyî bû ji zîndanîkirin, darvekirin, kuştin û sivikatîpêkirina li hember zarokên we yên xweştewî, ku daxwaza wan azadî û rizgariya netewa wan û hemû xelkê Îranê bû ji çengên xwînmij ên wê rejimê, û gihandina hawara mafxwarin û zordariyê bû ji guhê hemû cîhanê re.

Naha jî dem hatiye ku di roja Çarşemê, 25ê Xermananê de û di çaremîn salvegera vê tevgerê de, bi yekdengî li gel Hevpeymaniya Hêzên Siyasî yên Kurdistanê, ez daxwazê ji hemû par û qatên civaka Kurdistana ezîz dikim ku di wê rojê de bi mana li malên xwe û neçûna ser karên xwe, beşdarî mangirtineke giştî bibin. Bi vê çalakiya nîştimanî careke din ji rejima şer û birçîbûnê re bibêjin ku Jîna û Jînayên din di dilê me de sax in. Em ne fidakarî û xwîna şehîdên xwe, ne jî tawan û xwînrijandina we ji bîr dikin.

**Serkevtin ji bo we gelê serbilind,Berdewam be tevgera Jin, Jiyan, Azadî.**

## Nûnasandina Têkoşîna Kurdî di Serdema Veguherînên Mezin de



Mijara vê rûpelê derbarê Rojavayê Kurdistanê di Navbera Tengbûna Erdî û Tengbûna Qada Ramyarî de‹Ji aliyê Dr. Mehmûd Ebas ve hatiye nivîsandin.

RUPELA 6

## Mangirtin, Rapersîyeke Berdewam



Mijara vê rûpelê derbarê mangirtinên Kurdistanê de ye ‹Ji aliyê Xatûn Aso Minberî ve hatiye nivîsandin.

RUPELA 5

## Ji Seqizê û Rojhilatê Kurdistanê ve ber bi cîhanê, Peyama Jin, Jiyan, Azadî




Mijara vê rûpelê derbarê giringiya Şoreşa "Jin, Jiyan, Azadî" û girîngî û cihê Kurdistanê de ye ‹Ji aliyê Xatûn Sefiye Xalidî ve hatiye nivîsandin.

RUPELA 10

# Daxuyaniya Desteya Kargêriya Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê, bi hikefta 34emîn salvegera terora Dr. Sadiq Şerefkendî û hevalên wî

26ê Xermanana îsal 34 sal bi ser terora Mîkonosê re derbas dibin. Roja ku Dr. Sadiq Şerefkendî, Sikretêrê Giştî ê Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê û hevalên wî, Kak Fetah Ebdulî nûnerê Hizbê li derveyî welat, Kak Humayûn Erdalan nûnerê Hizbê li Alman û Kak Nurî Dêhkurdî kesayetiyê diyar û çalakê siyasî yê opozîsyonê li bajarê Bêrlîna Alman di restoranta Mikonosê de bi destê tîrorîstên Komara Îslamî ya Îranê hatin şehîdkirin.




Terora Dr. Sadiq Şerefkendî mîna birîneke mezin li ser laşê bizava Kurd û Hizba Dêmokrata Kurdistana Îranê, ket ser birîna kûr a tîrora Dr. Qasimlo. Ji ber vê yekê, bi windakirina Dr. Şerefkendî, Hizba Dêmokrat û neteweya Kurd careke din rûbirûyî xisareke gelek mezin bûn.

Dr. Sadiq Şerefkendî kesayetiyekî ronakbîr, ferhengî û siyasî bû. Wî li Zanîngeha Bilind a Tehranê xwendibû û piştî çend salên mamostetiyê li dibistanên navendî yên bajarên Mehabad û Urmiyê, ji ber jêhatîbûn û şiyanên xwe, bûrsa xwendinê li derveyî welat pê hat dan û li welatê Firansê doktoraya kîmyayê wergirt. Her li Firansê wî Dr. Qasimlo naskir û bû endamê Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê. Piştre vegereya xwe ya ji derveyî welat, karê mamostetiyê li Zanîngeha Bilind domand û di heman demê de çalakiyên xwe yên siyasî li zanîngehan û di jîngeheke akademîk de bi dizî dest pê kirin. Piştî şoreşa gelên Îranê, weke endamê Deftera Siyasî ya Hizba Dêmokrat berdewamî da têkoşîna eşkere. Piştî şehîdbûna Dr. Qasimlo, Dr. Şerefkendî ku wê demê cîgirê sikretêrê giştî ê hizbê bû, bi yekdengiya Komîteya Navendî weke sikretêrê giştî ê hizbê hat hilbijartin.

Dr. Şerefkendî di dema berpirsiyariya xwe ya bilind a hizbê de nîşan da ku hevalekî dilsoz ê Dr. Qasimlo ye û nahêle xewna dijminan bo lawazkirina Hizba Demokrat pêk bêt. Ji ber vê yekê Komara Îslamî plana tîrorkirina wî danî û di 26ê Xermanana sala 1371ya Rojî de, piştî beşdarbûna di civîna Înternasyonala Sosyalîst de li bajarê Bêrlîna Alman, digel hevalên xwe hatin tîrorkirin.

Hizba Dêmokrat tevlî şehîdbûna Şerefkendî jî, ji ber cîgirbûna kultura rêberiya bihevre nîşan da ku tevî birîna giran a şehîdbûna rêberên xwe, rê nade dijminên Kurd û bizava wî ku bigehêjin armancên xwe. Ji ber vê yekê Hizba Dêmokrat li ser rêbaza rêberên xwe bi hêz ve di qada xebata neteweyî de ma.

Dr. Şerefkendî kesayetiyekî bihêz ê siyasî, rêber û rêveberê jêhatî, dilsozê rêbaza Hizba Dêmokrat û rijd di xebata bo rizgarkirina Kurd de bû. Wî hemû şiyanên xwe xistin xizmeta Hizba Dêmokrat û bizava Kurd li Rojhilatê Kurdistanê, bi awayekî ku encama vê xweterxankirinê bandoreke kûr li ser rêbaz û xebata Hizba Dêmokrat hişt.

Piştî tîrora Dr. Şerefkendî, di demekê de ku Komara Îslamî gelek hewl da rê li ber lêkolînkirina dosyaya vê tîrorê bigire, lê ji ber serbixweyiya dezgeha dadwerî ya Alman, wêrekiya dadweran, hewla berdewam a parêzerên dosyayê û hebûna îradaya gehandina encamê ji vê dosyayê re, di dawiyê de dadgeha Berlînê – ku bi navê Mikonosê navdar bibû – piştî çend salên lêkolînê di 10ê Nîsana 1997ya Zayînî de biryara xwe ya dawî ragihand. Bi eşkereyî rêberên Komara Îslamî ya Îranê di asta herî bilind de wekî planrêj û rêveberên vê kiryara tîrorîstî dan nasîn û biryara girtina tawanbaran derxist. Di vê peywendiyê de û piştî derketina biryara tawanbarkirina Komara Îslamî ya Îranê, welatên Ewropayî wekw nîşandana nerazîbûnê li hember vê kiryara rejimê, balyozên xwe ji Tehranê vekişandin, lê mixabin paşê berjewendiyên xwe yên aborî xistin pêşiya rawestandina destdirêjî û midaxaleyên Komara Îslamî li ser serweriya siyasî ya welatên xwe.

Di vê derheqê de hewce ye em bînin bîra xwe, her çend dezgeha dadwerî ya Alman hemû belgeyên bo dosyaya tîrora Mikonosê hewcedar di dest de nebûn, lê ji ber ku îradeya wan hebû, karê dadgehê bi awayekî yasayî gehandin encamê. Berevajî dezgeha polîs û dadwerî ya Otrîşê ku gelek belgeyên zelal ji tîrora Dr. Qasimlo di dest de bûn, lê ji ber neserbixweyiya dezgeha dadwerî ya wî welatî û destêwerdana berjewendîperestane ya dewleta wê demê ya Otrîşê, rê li ber pêvajoya yasayî a dosyaya tîrora Viyanayê hat girtin. Bêguman ger wê demê dewleta Otrîşê û dezgeha wê ya dadwerî mîna Alman û dezgeha wê ya dadwerî reftar kiriba, mimkun bû ji wê derê ve maşîna terorê ya Komara Îslamî bihata rawestandin û di hemû ew terorên li Ewropayê hatin kirin, nedihatne kirin ku yek ji wan tîrora Mikonosê bû.

**Xelkî hêja yê Kurdistanê!**

26ê Xermanana îsal di demekê de em yad û bîranîna Dr. Şerefkendî û hevalên wî, armanc û têkoşîna wan bibîr tînin û peymana xwe bo rêbaza wan nû dikin, ku Komara Îslamî ya Îranê ji her demê zêdetir di qada siyaset û peywendiyên navdewletî de hatiye îzolekirin. Siyaseta şerxwazî, destêwerdana di karûbarên welatên herêmê de û alozîçêkirinên wê bi rêya komên xwe yên proksî di Rojhilata Navîn de, Komara Îslamî kiriye navenda pirsgirêk û aloziyan di herêmê de, bi awayekî ku Amerîka û welatên herêmê gehandine wê baweriyê ku hewce ye bo bersivdana serberedayî û siyasetên xelet yên vê rejimê sînor werin danîn.

Komara Îslamî piştî derbaskirina du şeran di sala borî de, ji her demê zêdetir di dîroka deshilatdariya xwe ya tijî zordarî û tepeseriyê de ketiye bin zextên navdewletî. Dorpêç û givaşên aborî, û daketina nirxa pereyê wê, derbeyeke mezin li aboriya Îranê da, bi awayekî ku jiyan û bijîva xelkê Îranê xistiye rewşeke gelek giran û xirab ku rêvebirina jiyana rojane bo xelkî zehmet bûye, anku qonaxek ku metirsiya birçîbûna xelkî ji ber zextên aborî aniye holê.

Ji aliyekî din ve, tevî van hemû astengî û dijwariyan bo xelkî, hevkarînekirina Komara Îslamî ligel Ajansa Navdewletî ya Enerjiya Etomî bûye sedem ku ajans bi piraniya denga dosyaya etomî ya Îranê radestî Şêwreya Ewlekariyê ya Neteweyên Yekbûyî bike. Şêwreyê jî roja pêncşemê, 19ê Xermanana 1405ya Rojî, biryara vegerandina dorpêçên li ser Îranê da, ku bêguman ji vê sedemê pirsgirêkên aborî dê zêdetir berê xwe bidin vê rejimê û di encamê de xelkê welat jî. Eşkere ye ku Komara Îslamî di heyamê nêzîkî pênc dehsalên deshilatdariya xwe de selmandiye ku ne tenê jiyan û bijîva xelkî bo wê ne giring e, belkî hemû siyaset û kiryarên wê di çarçoveya bihêzkirina hêzên xwe yên niyabetî di herêmê de û mana xwe li ser deshilatê ye, û saman û dewlemendiya welat bo vê armancê xerc dike. Li rex vê rewşê, kontrolkirina tengava Bab el-Mendeb ji aliyê Hûsiyên Yemenê ve bi fermana Spaha Pasdaran, pirsgirêkeke din xistiye ser pirsgirêkên herêmê û cîhanê, ji ber ku ewlehiya yek ji rêyên herî giring yên bazirganiya cîhanî ketiye metirsiyê û ew jî bi îhtîmaleke mezin dê helwesta welatên Ewropayî li pey xwe bîne, ku ew jî bi wateya geşbûna agirê şer e ku Komara Îslamî dixwaze li hemû vê herêmê belav bike.

**Xelkê xebatkar ê Kurdistanê!**

25ê Xermanana îsal çar sal bi ser şoreşa Jînayê re derbas dibin, ku piştî kuştina hikûmetî ya Jîna Emînî (kça Kurd a 22 salî li Tehranê) bi dirûşmê "Jîn, Jiyan, Azadî" bû sedema serhildanek giştî li Îranê ku pêt û çirûska wê ji Kurdistanê hatibû lêdan, serhildana bizavekê ku encama yekgirtiya hêzên siyasî yên Kurdistanê û banga wan a hevbeş bû. Di vê barê de, komên fireh yên xelkê Kurdistanê peyama xwe dan partiyên Rojhilatê Kurdistanê ku eger hûn yek bibin, em yekgirtî û yekdeng in. Herwisa peyama xwe dan Komara Îslamî ku ew piştevaniya hêzên xwe yên siyasî dikin û ji xwîna bi neheqî rijandî a lorîkên Kurd derbas nabin.

Hewce ye em bibîr bînin ku Dr. Şerefkendî di demekê de hat Şehîdkirin ku ligel çend kesayetiyên opozîsyona Îranê li ser mijara hevkarî û yekgirtinê mijûlî guhartina dîtin û ramanan bûn. Niha piştî derbasbûna 34 salan bi ser şehîdbûna wî, ji her demê zêdetir hewce ye opozîsyon di asta Kurdistan û Îranê de yekgirtî be. Ew mijara ku Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê di her du astan de hewla wê dide, bi awayekî ku bidestveanîna mafên neteweyî yên Kurd di vê yekgirtinê de garantî bibe û yekgirtinê bi baştirîn rê bo rizgarbûnê ji Komara Tîrorîstî dizane.

Silav li canê paqij e Dr. Sadiq Şerefkendî û hevalên wî, Kak Fetah Ebdulî, Kak Humayûn Erdalan, Kak Nurî Dêhkurdî û hemû şehîdên rêya rizgariya Kurdistanê!

Berdewam be xebata hizba me di rêya dêmokrasiyê û bi destveanîna mafên neteweyî yên gelê me de!

**Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê**
**Desteya Kargêrî**

**16ê Îlona 2026an a Zayînî**

# Nêrîna Hizba Dêmokrat li ser raporta Rêxistina Lêborîna Navneteweyî




Rêxistina Lêborîna Navneteweyî di çaremîn salvegera kuştina Jîna Emînî û destpêkirina serhildana «Jin, Jiyan, Azadî» de bi belavkirina raporteke giştgir û belgekirî ragihand ku di dema xwepêşandanên tevgera «Jin, Jiyan, Azadî» de desthilata Komara Îslamî bi awayekî sîstematîk cinayetên dijî mirovahiyê kirine. Di vê çarçoveyê de daxwaza lêpirsîn û şopandina dadwerî ji bo dehan berpirsên Komara Îslamî dike.

Li gorî naveroka raporta Rêxistina Lêborîna Navneteweyî ya li ser tepeserkirina serhildana «Jin, Jiyan, Azadî» di sala 1401'an de, belgeyên girîng û diyarker li ber dest in derbarê ast û mezinahiya wan tawanên ku Komara Îslamî dijî xelkê Îranê, bi taybetî xelkê Kurdistanê, encam dane.

Belavkirina vê raportê di demekê de ye ku berê jî Komîteya Serbixwe ya Navneteweyî ya Derxistina Rastiyan, ku ji aliyê Civata Mafên Mirovan a Neteweyên Yekbûyî ve ji bo şopandina binpêkirinên berfereh û sîstematîk ên hêzên fermî yên Komara Îslamî di tevgera Jînayê de -di 21'ê Novambera 2022'an de- hatibû avakirin, di raporta xwe de gihîştibû encameke hevseng.

Komîteyê ragihandibû ku beşek ji binpêkirinên mezin ên mafên mirovan ku ji aliyê desthilatdarên Komara Îslamî ve di dema tepeserkirina serhildanê de hatine kirin, gihîştine asta tawanên dijî mirovahiyê.

Ev tawan kuştin, êşkence, girtina xweserane, destdirêjî û cureyên tundiya zayendî, windakirina bi zorê û binpêkirina mafên mirovan dihewînin ku bi armanca cîbicîkirina siyaseta hikûmetê hatine kirin û dikevin çarçoveya tawanên dijî mirovahiyê.

Rêxistina Lêborîna Navneteweyî di dawiyê de daxwazê ji Civata Giştî ya Neteweyên Yekbûyî dike ku bi lezgînî mekanîzmayeke dadwerî ji bo şopandina vê pirsê bi armanca komkirina belgeyan, lêkolîn û darizandina berpirsên têkeldarî van tawanên dijî mirovahiyê yên li Îranê ava bike.

Herwisa tekez kir ku xetereya siyasî di Civata Ewlekariyê de, berferehiya tawanan û îhtimala bilind a dubarebûna van tawanan nîşan dide ku avakirina vê mekanîzmayê hewcedariyeke lezgîn e.

Li gorî belge û lêkolînên saziyên serbixwe û navneteweyî, tepeserkirina serhildana «Jin, Jiyan, Azadî» ne tenê çend bûyerên cuda û parçekirî bûn, belkî beşek bûn ji pêngaveke berfereh û sîstematîk dijî xelkê nerazî. Ya girîng ku di vê raportê de divê balê bikişîne ser ew e ku bi zelalî behsa asta tepeserkirin û binpêkirinên li dijî du neteweyên Kurd û Belûç hatiye kirin, û belge nîşan didin ku asta tepeserkirinê di van du herêman de gelekî mezintir e ji navçeyên din ên Îranê.

Bi berçavgirtina encamên her du raportên Rêxistina Lêborîna Navneteweyî û Komîteya Derxistina Rastiyan a Neteweyên Yekbûyî, rastiyeke nediyarker li ser doza Kurd li Îranê û derbasbûya tijî karesat a vê neteweyê di serdema her du hikûmetên paşayetî û Komara Îslamî de derdikeve hole, rewşek ku mafên bingehîn ên gelê Kurd bi awayekî sîstematîk û berfereh binpê kirine û encamên tawanên mezin ên navneteweyî jê çêbûne.

Berdewamiya vê rewşê, pêwîstiya şopandina rehên avahiyî yên binpêkirina mafên mirovan li Kurdistanê bêtirî her demê eşkere dike, ku ew jî pêkanîna mafê diyarkirina çarenivîsa gelan e wekî prensîbeke bingehîn a qanûna navneteweyî û mafekî naskirî di peymanên navneteweyî yên mafên mirovan de.

Ji ber vê yekê çareseriya bingehîn a dawîanîna li tepeserkirina gel û garantîkirina mafên gelê Kurd tenê di vê dergehê re pêk tê. Belgên raporta Rêxistina Lêborîna Navneteweyî bi zelalî nîşan didin ku cudakariya sîstematîk a li dijî gelên bin dest ên Îranê bûye sedema çi binpêkirinên berfereh ên mafên mirovan.

Ji aliyekî din ve, pirsa navneteweyîkirina binpêkirinên mafên mirovan li Îranê, dewletên demokratîk û wan dewletên ku di yasayên xwe de desthilata dadwerî ya cîhanî nas kirine erkdar dike ku îmkanên xwe yên qanûnî û dadwerî ji bo şopandin û cezakirina kiryar û biryardarên van tawanan bi kar bînin û di pêkanîna dadperweriyê û rêgirtina li dubarebûna van tawanan de beşdar bibin.

Nabe civaka navneteweyî rê bide ku erdnîgarî, sînorên siyasî û herwisa nebûna îradeya dadperweriyê di wan welatan de ku tawanên mezin tê de hatine kirin, bibe sedema parastina tawanbaran û pêknehatina dadperweriyê.

Pêkanîna dadperweriyê ji bo qurbaniyên van tawanan, naskirina fermî ya mafê diyarkirina çarenivîsa gelê Kurd û gelên bindest ên Îranê û dawîanîna li parêzbendiya dadwerî, sê sedemên sereke ne ji bo rêgirtin ji dubarebûna tawanan û misogerkirina paşerojekê ku tê de mafên mirovan, azadî û kerameta mirovî parastî bin.

Hizba Demokrat a Kurdistana Îranê digel pêşwazîkirina vê raportê û bîranîna raporta Komîteya Rastîyabîn a Neteweyên Yekbûyî, tekez dike ku civaka navneteweyî nabe bi derbasbûna demê re tawanên Komara Îslamî ji bîr bike. Bi taybetî ku her du lêkolînan bi awayekî serbixwe û bi piştgirêdan bi belge û şahidiyan, tawanên desthilatdarên Komara Îslamî wekî tawanên dijî mirovahiyê nas kirine, ev yek berpirsiyariya dewlet û berpirsên siyasî û ewlehiyê yên wê rêjîmê ji berê pitir dixe ber çavên civaka navneteweyî.

Komara Îslamî nikare bi derbasbûna demê, guherandina berpirsan an xweveşartina li pişta avahiyên hikûmetê, ji berpirsiyariya van tawanan xwe bide alî.

Ji ber vê yekê, Hizba Demokrat a Kurdistana Îranê daxwazê ji civaka navneteweyî û Neteweyên Yekbûyî dike ku li ser bingehê van belgeyan, pêngavên pratîkî di rêya dabînkirina dadperweriyê ji bo qurbaniyan û lêpirsîna ji berpirsên Komara Îslamî de bavêjin.

Herwisa ji nêrîna Hizba Demokrat ve, bêyî guherandina sîstema desthilatdariyê li Îranê, binpêkirina berfereh û sîstematîk a mafên mirovan dawî nayê û vegerandina mafên qurbaniyan û pêkanîna dadperweriyê çênabe.

**Hizba Demokrat a Kurdistana Îranê**
**Desteya Kargêrî**
**27'ê Xermanana 1405'an a Rojî**
**18'ê Îlona 2026'an a Zayînî**

# Banga mangirtina giştî ya 25ê Xermananê




**Xelkê xweragir ê Kurdistanê!**
**Hevwelatiyên xebatkar!**

Çar sal bi ser şehîdkirina Jîna Emînî û serhildan û tevgera Jîna yê a "Jin, Jiyan, Azadî" re derbas dibe. Şehîdbûna Jîna bû xala veçerxana dîrokî, ku tê de berteka bêhempa û bivêrane ya xelkê têkoşer û azadîxwaz yê Kurdistan û Îranê, bingehan rejîma tepeserkar a Komara Îslamî hejand û dengê azadîxwaziya neteweya me û hemû azadîxwazên Îranê gihande cîhanê.

Îro di demekê de em diçne nava salvegera vê serhildana seranserî ku rewşa xelkê û pirsa azadiyên wan di rewşeke herî xerab de ye. Bi taybetî piştî şerê Îranê digel Amerîka û Îsraîlê, tev krîzên siyasî, civakî û aborî bi awayekî berfireh kûrtir bûne. Desthilat ji bo veşartina şikestên xwe li asta derve û lawaziya xwe ya navxweyî, givaşên ewlehî û aborî bo ser xelkê vêzarbûyî yê Kurd û Îranê çend qat zêde kiriye, bi awayekî ku hejarî, giranî, bêkarî û nebûna azadî û ewlehiyê jiyana rojane ya welatiyan ber bi astek nebaş biriye.

Tevî berfirehbûna nerazîbûnan û zindîbûna tevgerên cuda, rejîm siyaseta kuştin û tepeseriyê didomîne. Pêla binçavkirina têkoşerên siyasî, çalakên medenî, parêzvanên mafên jinan, çalakên çandî, jîngehparêz, kedkar û mamosteyan berdewam e û zêdetir jî bûye. Sepandina cezayên giran yên girtigehê û zêdebûna bêmînak ya cezaya darvekirinê, ji aliyekê ve nîşana tirsa rejîmê ji îradeya xelkê ye, û ji aliyê din ve nîşaneya pêdagiriya wê li ser tundûtûjiyê ye, ku bingeha desthilatdariya wê ye.

Gelê Kurd ku di dîroka hevçerxa Îranê de hertim pêşengê têkoşîna ji bo azadiyê bûye, di vê rewşa hestiyar de jî roleke dîrokî li sitûyê wê ye, Derbaskirina vê qonaxê û derbasbûna ji vê rejîmê, tenê bi yekîtiyê û îradeya yekalîker ya xelkê tê kirin. Bandora hebûn û berdewamiya têkoşînê di warên cuda de û rola xebata medenî û seranserî ya civakê, ji bo xistina qdemaye desthilatê û herwisa nîşandana îrade û yekîtiya hemû qadên civakê, mijareke îspatbûyî ye.

Lidarxistina nerizayetiyên siyasî û medenî û bi taybetî mangirtinên giştî yên Kurdistanê, her ji destpêka hatine ser kare Komara Îslamî heta îro nîşan daye ku pêvajoya daxwazên neteweyî û azadîxwaziyên Rojhilatê Kurdistanê ji hêla siyasî û bingehên wê desthilatê cuda bûye. Neteweya me di dîroka têkoşîna xwe de bi pêkanîna mangirtinên giştî û dîrokî, bilî tekezîkirin ji mafên xwe, li dijî tundûtûjî û tepeserkariyê jî sekiniye û peyama siyasî û medenî ya têkoşîna xwe nîşanî cîhanê daye.

Bi berçavgirtina rewşa niha, wek Hevpeymaniya Hêzên Siyasî yên Kurdistana Îranê, em bang li hemû parên civakê dikin ku roja 25ê Xermananê û di çaremîn salvegera tawana kuştina Jîna Emînî de, mangirtinek seranserî û giştî li dijî berdewamiya siyasetên Komara Îslamî pêk bînin. Ev mangirtin, bilî bîranîna hemû şehîdan û nirxên Şoreşa "Jîna" a naskirî bi "Jin, Jiyan, Azadî", têkoşînek medenî û bersiveke girseyî ye li dijî krîzên ewlehî û aborî, û dê bibe peyama zindîbûna têkoşîna medenî û berxwedana xelkê Kurdistanê.

Em daxwazê ji tev xelkê têkoşer û azadîxwaz dikin ku roja Çarşemî, 25ê Xermananê, bi girtin û daxistina dukan û bazaran û man li malên xwe de, beşdarî vê mangirtina giştî bibin û hemû bi hev re, bi helwesteke yekgirtî, dubare bikin ku gelê me ji her derfetekê ji bo gihiştin bi mafên berheqe xwe mifahê werdigire û ti carî teslîmî zilmê nabe. Ev mangirtina giştî dê gavêk girîng û peyameke zelal a berxwedanê be ji bo xurtkirina îradeya siyasî û neteweyî ya me. Ji ber vê yekê, em herwisa bang li hemû aliyên siyasî û rêxistinên siyasî û medenî dikin bi piştivanê lidarxistina ev mangirtina giştî bin, da ku bi yekrêzî û bi hêza têkoşîna medenî ya xwe nîşan bidin ku sîstema tepeseriyê û sêdaredanê, ti carî nikare pêşiya têkoşîna me ya rewa bigire.

**Hevpeymaniya Hêzên Siyasî yên Kurdistana Îranê**
**22ê Xermanana 2726 Kurdî**
**13ê Îlona 2026 a Zayînî**

# Spasnameya Hevpeymaniya Hêzên Siyasî yên Kurdistana Îranê derheq bi serkeftina mangirtina giştî a 25ê Xermanan

**Xelkê serbilind û xweragir ê Kurdistanê!**

Di çarhemîn salvegera şehîdbûna Jîna Emînî û bilindragirtina bîranîna şehîdan û destkeftiyên tevgera "Jin, Jiyan, Azadî" de, mangirtina giştî ya 25ê Xermanan wekî bersiveke biryardarane û helwesteke yekalîker bi serkevtî bi rêve çû.

Ev mangirtina giştî di demekê de bi rêve çû ku rejîma Komara Îslamî ya Îranê hemû hêz û şiyana xwe ya leşkerî û ewlehiyê ji bo militarizekirina bajarên Kurdistanê û drustkirina givaş û gefên cûrbecûr li ser bazariyan û xelkî bikar anîbû. Belê îradeya behêz a xelkê Kurdistanê û helwesta berpirsiyarane ya dukandar û bazariyan, deshilat tuşî şikestê kir. Pêdiviyê amajekirinê ye, piştevanîkirina ji vê bangewazê ji aliyê dehan partî û layenên siyasî, rêxistinên jinan û civaka medenî li asta Kurdistan û Îranê û herwisa peywestbûna beşek ji girtiyên siyasî bi rêya greva birçîbûnê, dibe nirxekî girîng ji bo karê hevbeş û hevpeywenda di têkoşîna me de bi dijî Komara Îslamî li her derfet û cîhekî de.




Serkeftina vê hereket û tevgera medenî nîşana asta bilind a berpirsiyariya civakî, hişyariya siyasî, yeketiya neteweyî û redkirina siyasetên tepeserî, cûdakarî û sêdarê ji aliyê xelkê Kurdistanê ve ye. Herwisa selmînera vê rastiyê ye ku hêzên siyasî û civaka Kurdistanê beşekî jev neweqtiyayî ne û ev peywendiya kûr sermayeyeke mezin a siyasî û civakî ye ji bo berdewamiya xebat û gavên pêşerojê.

Hevpêymaniya Hêzên Siyasî yên Kurdistana Îranê, ji bilî rêzrgirtin li xweragiriya neteweya Kurd û spasiya wê helwest û yekgirtiya xelkî li bi-rêvebirina mangirtina 25ê Xermananê, pêzanîna xwe pêşkêşî tev kesayetiyên siyasî, akademîk û bi taybetî aliyên siyasî yên Belûç, Turk, Fars, Turkmên û Ereb dike ku bi belavkirina peyam û vîdyoyan piştevaniya xwe û havdengiya xwe ligel banga mangirtinê dane xuya. Ev hevkarî û piştevaniya berfireh nîşana pêgeh û pêşengayetiya Kurdistanê ye li asta seranserî ya Îranê de.

Hêzên siyasî yên Kurdistana Îranê dubare dikin ku berdewam pabend dibin bi nûnertîkirin û gehandina dengê daxwazên rewa û berheq yê civakê, û vê yektî û hevbeşiyê bi garantîya serkeftinên li pêşerojê de dizanin.

**Hevpêymaniya Hêzên Siyasî yên Kurdistana Îranê**

**25ê Xermanana 2726**

# Mangirtin, Rapersîyeke Berdewam



N. Aso Minberî




Di 25ê Xermanana îsal de, 4 sal bi ser kuştina hikûmetî ya Jîna Emînî û destpêkirina şoreşa Jîna di bin dirûşma pêkhateşikên a "Jin, Jîyan, Azadî" re derbas bûn.

Lê belê, mangirtina giştî ya vê carê, mijareke din jî xiste berça. Vê mangirtinê sînorê di navbera şoreş û tevgerê de careke din diyar kir.

Tevger dikare di heyameke taybet de rû bide û li kolanan bi dawî bibe, lê belê tevgera ku avahiya civakê diguherîne û wijdana giştî ya civakê dixîne bin bandora xwe, şoreş e!

Ev rastî piştî 4 salan weha ji me re dibêje ku peywendiya rêxistinkirî ya gel bi malbata Jîna û hemû şehîdên şoreşê re ne tenê nehatiye birîn, belkî berdewam di formên nû de xwe nîşan dide û disilmîne ku "Jin, Jîyan, Azadî" tenê rabûna hestan di qonaxeke taybet de nebû, belkî guherîneke hişmendane bû ku bo paşve venagere. Civaka Kurdistanê, ramana xwe ya giştî parastiye û mafxwaziyê wek amrazekî ji bo têkoşînê, zindî hiştiye.

Yek ji giringtirîn rexneyên ku di heyamê çar salên borî de li ser tevgera cemewerî ya sala 1401an hebû, bikaranîna peyva "tevger" û axaftina li ser bêdengbûn û rawestana nerazîbûnên li ser kolanan bû.

Lê belê bûyerên meha Befranbarê û herwisa çaremîn salvegera kuştina hikûmetî ya Jîna di roja çarşemê 25ê Xermanana îsal de, dikare bibe bersiveke baş ji bo vê rexneyê.

Komara Îslamî wek adetê xwe yê herdemî, li ber çaremîn salvegera kuştina hikûmetî ya Jîna Emînî, her ji destpêka meha Xermananê ve bi rêyên cûrbecûr amadekariyên xwe ji bo dijayetiya bi gel re û bilindgirtina bîranîna Jîna û şoreşê dest pê kir.

Ji destpêkirina girtinên giştî ji bo tirsandina gel, heta firehkirina kamerayên çavdêriyê li goristana Ayçiyê û leşkerîkirina bajêrên Kurdistanê û ji hemûyan giringtir Seqiz, bajarê Jîna Emînî, nîşan dan ku Komara Îslamî çiqas bi tirsonekî, dixwaze bi darê zorê û tepeserkirina dîsa, rê li ber bilindgirtina bîranîna şehîdan û şoreşeke ku heta îro jî berdewam e, bigire.

Di roja 22ê Xermananê de hevpeymaniya hêzên siyasî yên Kurdistanê, bi xwendinekê ji bo rewşa niha ya civaka Rojhilatê Kurdistanê di bangewazekê de, ji xelkê Kurdistanê daxwaz kir ku bi helkefta çaremîn salvegera şehîdkirina Jîna Emînî, bi girtina dukan û bazaran û man li malên xwe, bibin beşek ji vê mangirtina giştî.

Hevpeymaniyê ragihandibû ku "Ev mangirtin ji bilî bîranîna hemû şehîdan û nirxên şoreşa «Jîna – Jin, Jîyan, Azadî», têkoşîneke sivîl û bersiveke cemewerî ye dijî qeyranên ewlehî û aborî û dibe peyama zindîbûna têkoşîna sivîl û berxwedana xelkê Kurdistanê."

Bi derxistina vê bangewazê re, zextên Komara Îslamî jî zêdetir bûn, lê civaka Kurdistanê bi hesta berpirsiyariyê û bi wêrekî, di meydana têkoşînê de, rola xwe ji bo careke din diyartir kir.

Di demekê de ku bajarên Kurdistanê û bi taybetî bajarê Seqizê rûbirûyî yek ji girantirîn awayên leşkerîkirinê bûn û bicihkirina hêzên tepeserker bi awayekî berfireh hatibû kirin, mangirtina giştî ya xelkê Kurdistanê, bersiveke zelal ji bo vê bangewazê di forma rapirsiyeke giştî de bû.

Ewa ku xelkê Kurdistanê piştî çar salan bi malbata Jîna Emînî re bûn, selmand ku em ne rûbirûyî "şepêlekî nerazîbûnê" belkî rûbirûyî "herikîneke ji şoreşê" ne. Şoreş tenê dagirkirina kolanan nîne, belkî qutbûna hemû civakê ye ji sîstemekê ku li ser civakê serdest e, faktorek ku di mangirtina roja çarşemê de, bi zelalî hat dîtin.

Mangirtin di rewşeke wek rewşa evro ya Kurdistanê de ku nirxê dolar ji 230 hezar tumen derbas bûye û asta teweromê bi awayekî bê kontrol bilind bûye û gel ji bo dabînkirina pêdiviyên herî sereke yên jiyanê ecêbmayî mane, karekî hêsan nîne.

Kengê civakek di bin girantirîn rewşa ewlehî û leşkerî de, dest dide mangirtina giştî û aboriya civakê dike armanc, armanca wê ew e ku "Na"yeke bihêz û hevaheng ji desthilatê re bibêje. Di rastiyê de di wê rewşa aborî ya xirab de, ev mangirtina giştî, wek rapirsiyeke berdewam e, ji bo ku careke din bîne bîra desthilata serdest ku tevî hemû zilm û zordariyan, tevî hemû tepeserkirin û zextan, di meydana pevçûna bi gel re de, ew her wek herdem gel e ku serkeftiyê meydanê ye.

**Vê mangirtinê careke din nîşan da ku tevgera sivîl li Kurdistanê hêşta heye û navendên tepeserker yên rejîmê, bi pêşketîtirîn çekên fîzîkî yên serdemê re jî, ti rewabûnek li cem gel nemaye.**

Di vê navberê de rola aliyên siyasî û giraniya wan ya siyasî di civakê de di bersiva erênî ya civakê de ji bangewaza wan re tê dîtin ku tevî rewşa giran ya ewlehî, ew hişyariya siyasî ya civaka Kurdistanê ye ku dike ku dîsa gel bibe aktor û qehremanên sereke yên qadê. Ev hevahengiya di navbera civaka sivîl û aliyên siyasî de, bixwe yek ji bingehên şoreşgerîbûna vê tevgerê ye. Ji ber ku nîşan dide ku civak xwedî şiyana bersivdana rêxistinkirî û hevaheng e.

Ev nemana rewabûnê, di asta navdewletî de jî belav bûye û hevdem bi çaremîn salvegera kuştina hikûmetî ya Jîna re, Rêxistina Lêborîna Navdewletî bi belavkirina raporeke berfireh û bi belge, ragihandiye ku helwesta Komara Îslamî ya Îranê di pêvajoya tepeserkirina nerazîbûnên "Jin, Jîyan, Azadî" de, nîşana eşkere û sîstematîk ya "sûcê dijî mirovahiyê" bûye.

Ev rapor bi tekezkirina li ser pêdiviya pêkanîna dadweriyê û domandina lêkolîna dadwerî li ser bi dehan berpirsên pilebilind yên Komara Îslamî ya Îranê, nîşan daye ku civak ne tenê li kolan û mangirtina giştî de berdewam e, belkî lêçûna tepeserkirinê di asta navdewletî de ji bo desthilata Komara Îslamî gehandiye cihê ku vegeryan ji bo wê nîne.

Rapora Lêborîna Navdewletî diyar dike ku tepeserkirina sîstematîk ya Komara Îslamî dijî gel, aliyê sûcê navdewletî di nav xwe de girtiye û ev helwesta navdewletî, encama mafxwaziya berdewam ya malbatên şehîdan û berdewamiya têkoşîna gel e, belgeyên ku daxwaza darizandin û lêkolîna dadwerî ji berpirsên Komara Îslamî dikin û peywendiya di navbera berxwedana navxweyî û mafxwaziya navdewletî xurtir kirine.

Têkelbûna îradeya rêxistinkirî ya navxweyî di forma mangirtina giştî de û tohmetbarkirina Komara Îslamî bi sûcê cinayet dijî mirovahiyê li gorî belgeyên navendeke navdewletî nîşan didin ku hevsozî guheriye û êdî Komara Îslamî nikare bi sanahî li ser tepeserkirina xelkê berdewam bibe.

Xelkê Kurdistanê gehiştiye astekê ku ti girtin û tepeserkirin nikare wan paşve bibe û şoreşa Jîna bi destê wan ber bi pêşerojeke rohn ve diçe. Civaka sivîl îradeya xwe pênase dike û desthilata xwesepîner jî roj bi roj zêdetir ber bi hilweşîna yekcarî ve dibe.

# Nûnasandina Têkoşîna Kurdî di Serdema Veguherînên Mezin de


N. Dr. Mehmûd Ebas



**Beşa Heftem**

**Rojavayê Kurdistanê di Navbera Tengbûna Erdî û Tengbûna Qada Ramyarî de.**

Rewşa Rojavayê Kurdistanê êdî bi heman xwendinê nayê têgihiştin ku di salên destpêkê yên bilindbûnê de pêkan bû. Wê demê ezmûna Kurdî wisa xuya dikir ku ji cihê xwe yê dîrokî li kêlekê derdikeve û dibe hêzek di meydanê ramyarî û leşkerî de, ji bîranîna nasnekirinê derbas dibe bo hebûneke ku xwe li ser hevsengiyên şerê Sûriyê ferz kiribû.

Lê dîmen bi kûrahî hatiye guhertin, Ne ji ber ku fedakarî wateya xwe winda kirine, û ne ji ber ku ew xwîna ku di şerê li dijî DAIŞ û komên tûndrew de hate rijandin bêwate bûye, belku ji ber ku nexşeyên ku wê qonaxê çêkiribûn dest bi guherînê kirine.

Hêzên navneteweyî yên ku rê li ber firehbûna ezmûnê vekiribûn an heta radeyekê ew parastibûn, êdî bi heman çav lê nanêrin.

Tirkiye jî, ku her bilindbûneke Kurdî wek metirsiyeke dûrûdirêj li ser avahiya xwe ya navendperest a neteweyî didît, karî li ser rêça nû ya Sûriyê zextê zêde bike.

Bi vî awayî Rojavayê Kurdistanê îro di navbera desthilateke navendî ya mezhebî ku nû xwe ava dike, bandora Tirkiyeyê ya ku di hundirê Sûriyê de fireh bûye, sarbûneke eşkere ya Amerîkayê, û dabeşbûneke Kurdî de hatiye tengavkirin, dabeşbûnek ku êdî ne kêşeyeke ramyarî ya duyemîn e, lê dikare bibe metirsiyek li ser hebûnê bi xwe.

Ezmûna Kurdî li Rojavayê Kurdistanê di demeke awarte ya dîroka Sûriyê de derket holê. Gava desthilata navendî li beşên fireh ên welat hilweşiya, gava bêserûberî fireh bû, û derî li ber DAIŞ, El-Nusra, bermayiyên Beasê û dezgehên hêzên herêmî vebûn, Kurd li hember valahiyeke mezin man.

Berî ku li ser şêwaza dewleta pêşerojê bihizirin, neçar bûn civaka xwe biparêzin.

Di wê demê de çek ne hilbijartineke îdeolojîk bû, lê pêdiviyeke hebûnê bû.

Heger hêza leşkerî ya Kurdî nehatibû avakirin, û paşê Hêzên Sûriya Demokratîk nehatibûn derketin holê wek hêzeke rêkxistî ya meydanê, dibe ku qadên fireh ên Rojavayê Kurdistanê bikeftana destê komên tûndrew, an jî destê wan hêzên ku li gorî daxwaza Enqere, Doha û paytextên din hereket dikirin, paytextên ku di gelê Kurd de ne doza gelekî didîtin, lê girêkek ku divê bê vekirin an di nav sînorên wan de bê girtin.

Lê girêka mezin ew bû ku ya di dema şer de ji dayik bû, bi qasî pêdivî nekarî di dema veguherînan de bibe projeyeke ramyarî ya bi kok.

Rewşa leşkerî parastineke kêm-zêde peyda kir û ji Kurdan re giraniyeke di danûstandinan de da ku berê tune bû.

Lê ew nekarî bibe avahiyeke neteweyî ya Kurdî ku hemû aliyên Kurdî li dora xwe kom bike, nekarî aboriyeke hevgirtî ava bike, û ne jî damezrandinên ku li hember veguherîna hevsengiya hêzan xwe ragirin.

Herwisa, ramana "Neteweya Demokratîk", tevî gotara xwe ya ku pirrengiyê diyar dikir, nekarî bersiveke têr bide pirsa neteweyî ya Kurdî, wek ku gelê Kurd bi xwe wê dijî.

**Evê raman hewl da ji netewetiyê wêdetir here, berî ku Kurd mafên xwe yên bingehîne neteweyî bidest bixin.**

Hewl da nasnameyeke ramyarî ya li ser neteweyan ava bike, di nav Sûriyeke ku tijî nakokiyên neteweyî û mezhebî yên tûj bû, û di nav herêmeke ku heta mafê Kurdan ji bo danasîna xwe wek gel jî nas nedikir.

Bi derbasbûna salan re, ev kêmasî hêdî hêdî eşkere bû. Ezmûna ku dixwest xwe wek nimûneyeke derbasbûyî ji netewetiyan pêşkêş bike, xwe di navbera netewetiyên tund, dewletên navendperest, desthilatên mezhebî û projeyên herêmî de dît ku her nasînê ji bo Kurdan wek metirsiyek li ser avahiya xwe didîtin.

Kêmasî ne di ramana hevjiyanê bi xwe de bû, û ne jî di pêdiviya naskirina pêkhateyên din de, ev bingehên mirovî û ramyarî ne ku bê wan nabe.

Kêmasî di wê de bû ku proje carinan bingehê doza Kurdî paşguh kir, an ew di gotareke pir fireh de heland ku doza neteweyî ya Kurdî jê ewqas sûd nedît, wek wan hêzên ku dixwestin daxwaza eşkere ya Kurdî lawaz bikin.

Gava Kurd dev ji danasîna doza xwe wek doza gelekî, welatekî û mafên neteweyî berdide, ne pêdivî ye ku baweriya yên din bidest bixe, lê dibe ku hêza xwe ya danûstandinê bi navê xwe winda bike.

**Berdewam dike...**



## Nerîna Lîderan




**“Mistefa Hicirî”:**

**“ Parastina nirxên «Jin, Jiyan, Azadî», xwedîderketina li nirxên bizava Kurdistanê ye. «Jîna» ku bûye remza bizavê, li cem kurdistaniyan û hemû azadîxwazên Îranê xwedî cî û pêgeheke bilind e û parastî ye”**



**“Nêçîrvan Barzanî”:**

**“Sînema rêya herî kurt e ku em çîrokên xwe bigihînin cîhanê”**



**“Donald Trump”:**

**“Em ketine qonaxek krîtîk a biryardanê derbarê şerê li dijî Îranê de.”**



**“Israel Katz”:**

**Sala bê gelê Îranê dê ji birêvebiriya Tehranê rizgar bibe.”**

# Şoreşa Jînayê, Serhildan li dijî dagirkar û gava bêveger ber bi rizgariya Kurdistanê ve



N. Eskender Ceiferî



Şoreşa Jînayê, hewldan ji bo rizgarbûna neteweya Kurd ji desthilatdarî û kolonyalîzma navendî ya rêjîma Îranî ye. Serhildana ku bi şehîdkirina Jîna Emînî li Kurdistanê dest pê kir, di kûrahîya ramana xwe ya siyasî de, çirûskek li dijî desthilata dîrokî ya rêjîma Îranê li ser erdnîgariya Kurdistanê bû.

Vê serhildanê mask û perde ji rûyê hemû amûrên zordariyê rakir û pirsyar û mijara Kurdistanê ji derdorên siyaseta navendparêz anî navenda şerekî dije dagîrkar ji bo mafê diyarkirina çarenivîsê û rizgarîya netewî.

Desthilatdariya Kolonyalîzma Îranî û dagirkariya Kurdistanê, ji hev cuda nîn e. Rêjîma Îranê bi salan e ku bi sepandina modêla kolonyalîzma xwe, Kurdistan wek navçeyek bêparkirî di bin desthilatê de, ji çavkaniyên sirûştî, nasname, zimanê dayîkê û pêşketina siyaset û aborî bêpar kiriye.

Dijayetî û qedexeyîya navên Kurdî, sepandina çanda zimanî ya navendê, talankirina dewlemendiyên sirûştî û leşkerîkirina hemû qadên jiyanê, nîşaneyên diyar ên dagirkeriya nerm ên rêjîma Îranî ne.

Şoreşa Jînayê rûbirûbûneke aşkere li dijî vê dagirkariyê bû. Rêjîma Îranê ne tenê wek hikûmeteke dîktator, belkî wek hêzeke kolonyal ku erdnîgariya Kurdistanê xistiye bin destê xwe, bi berxwedana gelêrî re rûbirû bû.

Di vê şiroveyê de, zordariya sîstmatîk li dijî jinan û neteweyên ne-fars, faktorên ji hev cuda nîn in.

Di rastî de ew amûrên bi hev ve girêdayî yên dezgeheke kolonyal in ku ji bo parastina yekîtiya bi darê zorê li ser hesabê stendina nasnameya neteweyên din tevdigere.

Di vê dîtingehê de, «Jin, Jiyan, Azadî», felsefeya rizgariya ji tepisandina cinsî û netewî ye. Ew drûşma, ku ji dilê tevgera rizgariya Kurdistanê derket, ji drûşmeke bi daxwazên sînordar wêdetir, felsefeyeke wekhevîxwaz û dije dagirkar pêşkêşî xelkê kir.

Jina Kurd di vê şîroveyê de, di bin du zextên rêjîma dagirkar de ye û zordariya serdestiya bavsalariyê ji aliyekî ve û zordariya kolonyalîzma Îranî ji aliyê din ve, jina Kurd ku beşek ji neteweya Kurd e, difetisîne.

**Rizgariya jinê di wêjeya Şoreşa Jînayê de, hevwateya rizgariya civaka Kurdistanê û di encamê de gaveke bingehîn ber bi xwetêkildarî û azadiya bêkêmasî ya civakê ye.**

Vê şoreşê karî bi rexneya navendparêziya îdêolojîk û bavikserekiyê, paşxana fikrî û pratîkî ya nûjen ji bo serxwebûna siyaset û çandî ya Kurdistanê berhev bike.

Têkçûna projeya netewesazîya bi darê zorê û rêjîma navendparêz jî, encameke vê şoreşê bû. Projeyên netewesazîya bi darê zorê ku ji aliyê rêjîma Îranê û desthilatdarên berê ve hatine meşandin, her dem bi berxwedana neteweya Kurd re rûbirû bûne.

Şoreşa Jînayê nîşan da ku ev projeye piştî dehan salan ji sepandina zext, girtin û zordariyê, gihaştine karesat û astengiya bêdawî.

Hevgirtina ku di herikîna vê serhildanê de çê bû, xweradestkirinê nas nake. Lê belê ji rûbirûbûna giştî ya xelkê Kurdistanê li dijî rêjîmeke zordar hatiye holê.

Kurdistan pişta xwe bi dîrok, xebat, rêxistina sivîl û xelkê têkoşer germ dike û giraniyek cuda dide xebat ji bo rizgariyê. Di vê şoreşê de hat xuyakirin ku serweriya netewî, hêla sor a Kurdan e.

Ezmûna dîrokî ya xebata Kurdan xuya kiriye ku navendparêzên Îranê nikarin piralîbûna rastîn û mafê diyarîkirina çarenîvîsa neteweyên ne-fars qebûl bikin.

Heya ku erdnîgariya dagirkar neyê hilweşandin, guhertina desthilatan tenê dikare rengê hevkêşeyê biguherîne û dê zordariya netewî her bimîne. Wate eger dagirkar neyê hilweşandin, pirsgirêk nayên çareserkirin.

Ji ber vê yekê, salvegera Şoreşa Jînayê, nûkirina peymanê bi armanca wê şoreşê û rizgariya Kurdistanê re ye.

Ew heman çareseriya bingehîn e ku dê bibe dawiya dîroka dagirkariyê, zordariya kulturî û cudakarîya aborî. Mafê diyarkirina çarenivîsê, xêr nîn e ku rêjîma navendê bide Kurdan, belkî mafekî xwezayî ye.

Şoreşa Jînayê sînorên siyaseta di navbera Kurdistanê û dezgeha kolonyal a rêjîma Îranê de ji bo hertim mayînde kir. Ev tevgera zindî, gavavêtina di rêyeke bêveger de ye ku xala vê ya dawiyê tiştekî din ji bilî rizgariyê nîn e û hewl dide Kurdistanê rizgar bike.

**Di hejmara vê care de li ser tevgera Jin, Jiyan, Azadî û bandora vê tevgerê li ser jiyana civakê û rola jinan di vê tevgerê de me digel Evîn Mistefazade, Berdevka Saziya Mafê Mirovî ya Kurdpayê, hevpeyvîn encam daye.**



**Hevpeyvîn: Evîn Mistefazade**

**Hevpeyvînkar: Sîmîn**



**1. Jin di "Jin, Jiyan, Azadî" de tenê beşek ji yek dirûşima siyasî nebûn. Ji destpêkê ve jin di navenda nerazîbûnan de bûn. Piştî çar salan, dema ku em li wê serdemê binêrin, bi nêrîna we jin di vê tevgerê de çi guhertin çêkirine, û hikûmetê bi kîjan şêwe ji serkutê hewl da ku careke din kontrolê bigire destê xwe?**

Tevgera «Jin, Jiyan, Azadî» hem bi zulim û kuştina hikûmetî ya jineke dest pê kir û hem jî hebûn û beşdariya çalak a jinan bingeh û navenda sereke ya wê bû. Ev dirûşim tenê peyvek siyasî nebû; belkî encama salên dirêj yên daxwazkarî, berxwedan û têkoşîna domdar a jinan li Kurdistanê û li seranserê Îranê bû. Ev rê bi kuştina hikûmetî ya Jîna Emînî gihîşt serhildanekê ku destkevit û peyama wê ya azadîxwaziyê dê ji bo hemû deman bimîne û dikare her têkoşînek din jî wekî domandina wê bê pênasekirin; ji ber ku di hundirê civakê de guhertineke bingehîn û avaker çêkir.

Hebûna jinan li meydanê di nav civakê de hevgirtinek kûr û berfireh ava kir. Dema ku jinan li seranserê Îranê hebûna xwe li kolanan û di qada giştî de bi awayekî bêhempa xurt kirin, hemû aliyên jiyanê yên civakî guherîn; ji jiyana rojane bigire heta zêdebûna hêza wan a bikom ji bo daxwazkarî û parastina maf û daxwazên xwe. Ev tevger bi zelalî nîşan da ku li Îranê ti guhertin û şoreşek bê hebûn û mêhweriyeta jinan nikare veguherînek bingehîn biafirîne. Di heman demê de, peyama pêşketî ya vê tevgerê bandoreke mezin li ser cîhanê çêkir, bi awayekî ku her tevgerek azadîxwaz karî xwe di vê tevgerê de bibîne û nas bike.

Tevgera wiha rejîma dîktator û dijî jin a Komara Îslamî ewqas paşde xist ku, heta ger rejîm ji bo vegerandina kontrola xwe neçar bibe dest bi serkuteke berfireh bike ji girtin û zindanê heta qedexekirin û sînordarkirina civakî, betalkirina cewaza saziyên serbixwe û gefêm domdar dîsa jî ev rê dê bidome. Civak guhertineke ewqas kûr û bingehîn derbas kiriye ku êdî qet venagere rewşa berî vê tevgerê. Serkutên giran yên îroyîn nîşana dawî hatina tevgerê nînin; ji ber ku ger tevger bi dawî hatiba, hikûmetê ew qas hewcehî bi serkutê nebû.

**2. Raporên mafên mirovan behsa girtina jinan, azar û destdirêjiya sêksî, birîndarî û zirarên giran yên çavan, givaşên dadgehî û sînordarkirina civakî piştî nerazîbûnan kirine. Li gorî we, çima hîn jî beşeke mezin ji ezmûna jinên ku di van salan de zirar dîtine, nehatiye gotin û ragihandin? Tirs, givaşên ewlehiyê û nêrîna civakê çiqas di vê bêdengiyê de rol hebûye?**

Hemû ev faktorane bandorê li ser nebihîstina beşek ji wan rastî û biserhatiyan heye. Lê belê, bê tirs dikare bê gotin ku ew tiştê ku îro em di warê dadxwaziyê û vegotina çîrokên serkutê li Îran û Kurdistanê dibînin, bi girîngî li ser milên jinan e. Me di saziyên mafên mirovan de û di nirxandinên meydanî de ji nêzîk ve fêm kiriye ku jin, heta dema ku nexwazin nav û nasnameya wan eşkere bibe, bi baldarî û bi hûrguliyeke bilind serpêhatiyên xwe yên rastî vedibêjin, çi derbarê serkutkirina tevgera «Jin, Jiyan, Azadî» de be û çi derbarê serkutkirina nerizayetiyên piştî wê, wekî nerizayetiya Befranbara 1404an.

Ji aliyê din ve, divê bê zanîn ku hikûmet piştî vê serhildanê şêwaza serkutê ya xwe guherand û di gava yekem de berê xwe da aliyê tedbîrên pêşîlêgirtinê. Ev siyaset dikare di sepandina sînordariyên berfireh yên civakî û aborî li ser çalakvanên jinan, betalkirina destûra saziyên serbixwe û givaş û gefên domdar de bê dîtin. Li kêleka van tedbîran jî em şahidê serkuteke eşkere û dijwar a hikûmetî bûne.

Di nav vê rewşê de, jin hîn jî di saxitara mêrsalarane de û bi sînordarkirinên zêdetir yên civakî, aborî û siyasî dest û penceyan nerim dikin; ev yek jî bandoreke rasterast li ser eşkerabûna çîrok û serpêhatiyên wan dadinê. Lê, tenê ev yek ku jin dest bi vegotina serpêhatiyên xwe û dêkiyomêtkirina wan û ragihandina wan di medyayê û saziyên mafên mirovî dikin, nîşan dide ku di nava ev serkuta berfireh de, wan rêyekî zîrekane ya berxwedanê û hestkirin bi berpirsayetiyê hilbijartiye, ku ev yek pir bi nirx e.

**3. Piştî ku kesên nerazî hatin kuştin, di gelek rewşan de givaş xistine ser malbatên wan. Ji bangkirin û gef kirinan bigire heta astengkirina merasimên bi ax sipartinê, girtina rêyan bo goristanan û hilweşandina gorên wan. Bi nêrîna we, çima hikûmet heta merasimên tazî û dayik û malbatên mafxwaz weke pirsek ewlehî dibîne?**

Ev tevger ewqas guhertinî û veguherîner bû ku hemû kesên civakê gihandin vê encamê ku divê bi sembol û daxwazkarî li meydanê, têçû û bihayên ku dane bikin guhartinek. Kuştina mezilûmane ya Jînayê ku çalakvaneke siyasî nebû û tenê di seferê de bû nîşan da ku ev sûc dikarî li ser her keç û jineke di her malbatekê de bê. Ev mijar rewayeta hikûmetê bi temamî xist bin pirsê û rejîm neçar kir ku dest bi her cure serkutê bide; ji leşkerîkirina qadên giştî bigire heta serkutek berfireh.

Ev asta zêde ya serberdayî di serkutê de nîşan dide ku hikûmetê ti rêyek ji bo mana xelkê û raya giştî digel xwe de nehêlaye û ji her semboleke ku di bîra hevbeş a civakê de bi xwîn û biha hatiye nivîsandin û cihgirtin, ditirse.

mafxwazî tiştek nîne ku zû derbas be û biçe bi sepandina sînordariyan bê ji nav birin. Ger di hin qonaxan de malbatên mafxwaz neçar dibin ku kêmtir li meydanê xuya bibin û rêya berxwedan û xweragiriyê hilbijêrin, ev bi xwe yek ji nimûneyên binpêkirina mafên mirovan ji aliyê hikûmetê ve ye. lewma, ev malbat di civakê de bûne sembol û dengekî mayînde. Ev serdem derfeteke ku bikarin rola xwe ya siberojê rêkbixin û bêguman kesêm mafxwaz dê careke din bi hêzeke mezintir vegerin qada giştî.

**4. Niha ku çar sal derbas bûne, heke hûn bixwazin tenê bas ji yek guhertinê bikin ku jinên vê tevgerê di civaka Îran û Kurdistanê de afirandine û vegerandina wê bo rewşa berî Xermanana 1401an êdî bi hêsanî îmkan niye, ew guhertin çi ye?**

Guhertinên ku çêbûne pir kûr û bingehîn in û ev tenê destpêka rêyekî dîrokî ye. Jinan berî her tiştî jiyana xwe ya rojane guheranddin, wan biryar da ku bêne qada giştî, daxwazkarî bikin û bi nayek mezin bêjin sîstima dîktator û dijî jin. Dema ku jinan hêza xwe ya kesane û giştî li meydanê ceribandin û vegeriyan malan, êdî ew ne ew kesên berê bûn. Wan saxtara mêrsalarî di hundirê malan de şikandin û hin kilîşe û nerîtên kevin ji nav birin.

Îro hebûna zêde û berfireh ya jinan di qada giştî de heta ku eger weke nerizayetî nîşandan li ser şeqaman jî nebin yek ji girîngtirîn destkeftiyên mayînde ye ku hatiye bidestxistin. Jinan karîbûn qada giştî ji nû ve bistînin û bawer bikin ku hemû qad û warên civakê a wan in. Girîngtirîn gav ew bû ku daxwaz û mafên jinan di nav civakê de bibin mijareke bingehîn û vê tevgerê ev yek pêk anî. Ev destkevit e qet weke berê lê nahê; ji ber ku ev serhildanekî fikrî û civakî bû ku li dijî, hikumetekî herî dijî jin a cîhanê serhilda.

**Spas bo Evîn Mistefazade.**

# Di Nabeyna Du Blokên Hêjmon de Qedera Kurdan



N. Hesen Heranî




**Beşa 2**

Wekî me başa yekemîn a vê gotarê de got, tu hêzekî navber ne xwedîyê wê luksîyetêye ku bibe dûvikê hejmonîk, lê di heman demê de ti maf û luksîyetekî wî nîne ku bi temamî ji dervayî têkilî û hevkariyê jî bimîne. Ev xalekî herî hesase jibo me Kurdan. Wezna vê yekê divê baş bê kirin. Herdu rewş jî jibo Kurdan xetereye. Di rû de divê Kurd wek alîgirekî hêzekî xuya nekin. Lê di mijara berjewendî, pêwendî û kar û barên pêşerojê de hesab û kîtabê xwe bi pergala ku jibo xwe bi bikêr dibînin re bikin. Ev jî rastîyekî berjewendî, realîzm û pragmatîzmêye. Bêyî van her sê xalan sîyaset li Rojhelata naverast nayê kirin. Hemî hêzên hejmonîk di bingeh de li ser van her sê xalan dimeşin, ne li ser esasê îdeolojîk û mafê mirovahî ye. Mijarên mafê mirovahî, edalet, demokrasî alîyên meşrûîyetê ne.

Li Rojhelata naverast ji xeynî hêzên hejmonîk, hêzên herêmî jî dixwazin di vê dema navbihûr de ji xwe re rêriyek çêbikin. Ew jî dixwazin hesabên xwe yên hejmonîk li ser gelên herêmê an jî derdorê xwe ferz bikin. Îranê xwest vîya bike, lê per û baskên wî şikandin. Niha Tirkîye bi alîkarîya Ûris û bi çavşikandina Îngilîstanê dixwaze li ser herêmê rola serkêşêyê bixe destê xwe. Ev di heman demê de hemleyeke hejmonîk a Tirkan e. Tirk vê yekê dixwazin û jibo vê projeya xwe Kurd û Ereban wek amûrekî jê neveger dibîne. Ev emel û gavekî herî xetere jibo hemî Kurdan. Kurd alîkarî bidin vê xeyala Tirkan jibo Kurdan felaket û karesatên mezine. Jibo me Kurdan xurtbûn û belavbûna Îranê çiqas xeter bû ya Tirkan jî ewqas xetere. Lewre van dewletan xwedî nifûseke zêde ya mirovîne. Bi vê nifûsê bi hêsanî dikarin gelên herêmê kontrol bikin û bidin meşandin lê ya Îsraîlê nîne. Ev xal derfet dide yên xwedî nifûsa zêde ku bikaribin bi hêsanî gelên herêmê kontrol bikin. Lê ji ber ku di hişmendiya wan de rêzgirtin ji mafê gel û netewên din re nîne û ew kapasîteya wan a aborî jî nîne rê ji îdarekirina otorîter re vedike. Herwisa hêza nifûsa giran a li pey wan jî vî cesaretê li wan zêde dike. Otorîterîzm wek havêna deshelatîyên Rojhelata navarast e. Lê yê ku nifûsa wî hindik be û bi hêza nifûsê nikaribe kontrolê li ser gel û netewên din çêbike mecbûre wan gel û netewan bi halê wan bihêle û mafê azadî û demokrasiyê zêdetir nas bike. Cudabûna Tirkan û Îsraîlê di van xalan de derdikeve holê. Yek dixwaze bi hukmê otorîter wek Îranê herêmê îdare bike yê din dixwaze bi pîvan û zagonên medenî û sîyasî îdare bike. Ji ber vê yekê lewazbûna Tirk û Farisan, bihêzbûna Îsraîlê jibo me Kurdan riyek bêtir maqûl e. Em Kurd divê bi vê projeksîyonê li hêz û mûzîna herêmê binêrin. Nexwe hesabkirina şaş ya sîyasî her tim pêkane jibo me Kurdan. Şaşiyek konjonktorî û sîyasî dibe sedema têkçûna hemî hesabên din. Hesabekî ku em pê bi Tirkan re bimeşin şaşe. Tirk jî, Faris jî û Ereb jî ji nirxên mirovahî yên nûjen û medenî bêparin.

Îmkanên ku ew bikaribin herêmîîê bi awayekî demokratîk û aştiyane îdare bikin nîne. Ew aborî û teknîka Tirkan jî jibo vê yekê nîne. Dewletek ku nikaribe ji herêmê re pêşketinekê sîyasî, demokratîk, teknîkî û aborî tayîn bike nikare bibe demokrat. Ew encax dikare bi kanûn û zagonên otorîter îdare bike. Ev potansiyela Tirk û Ereban a demokrasiyê nîne. Lê ya Îsraîlê heye. Lewre Îsraîl ji hêla hişmendî, teknîkî û aborî de bi xwe afirîner û xwedîyê vê cîhana heyî an moderene. Yanî esil û orîjînale. Lê Tirk û Ereb û Faris ne wihane. Di hêla nîzama, mafên mirovî û pîvanên nûjenî de em Kurd bêtir nêzîkî sîstema moderenin. Ji ber vê yekê derfeta lihevkirina me û Îsraîlê ji yên din zêdetire. Di hesabên projeksîyona pêşeroja herêmê de tekez divê Kurd van xalan bigirin balê û bi gorî vîya tevbigerin.

Di demên pêş de Kurd li Rojhelata navarast bêtir wê di nava çûn û hatinên van sîyasetên têkilî pergala hegemonîk yên cîhanî de herin û werin. Îmkana ku Kurd bikaribin ji dervayî van hemleyên sîyasî, eskerî û dîplomatîk bimînin nîne. Ha bi vî awayî, ha bi wî awayî wê bi awayekî merûzê van sîyasetên ji dervayî wan tê meşandin rûbirû bimînin û dimînin jî.

Ne ku mirov alîyekî bêpar bihêle, temamîya alîyên Kurd 25 salên borî heba kirin. 25 salên borî baş nenîrxandin. 25 salên borî di derbarê sîyaseta navnetewî û xwe organîzekirina navxweyî ya netewî de bê hesab û bê kîtap derbaskirin. Ya girîng Kurdan van 25 salan de amadekarîya serûbinbûna herêmê nekirin, kiribin jî jibo vîya bi amadekarîyek ber bi çav di meriyetêde biser nexistin. Tenê bi ser kar û barên xwe yên navxweyî sekinîn û derxistin pêş. Nexwe hilweşîna Iraqê 2003 an mizgîna van rojan da bû me. Lê mixabin Kurdan vê dema borî de amadekerîyên xwe ji hêla leşkerî, sîyasî, tifaqî û dîplomatîk de nekirin û bend û astengên di nabeyna xwe de ranekirin. Hemî sîyasetên Kurd di hêla vîzyona serdema pêş de, gotin li cihê xwe be di polê de man.

Mixabin ji ber ne avakirina vîzyonekî sedsala pêş îro Kurd di her warê sîyaset û diplomasîyê de tengasîyên mezin dijîn. Me trêna pêşîn ya vê serdemê revand lê ya bê divê em nerevînin. Bêhêzkirina her dagirkerekî Kurdistanê jibo bihêzbûna me Kurdan derfeteke. Zanîn û maqûlî ew e ku em Kurd di nava lîstika kêşmekêşa rojhelata navarast de ji xwe re derfetên kêrhatî bibînin û di nava wan derfetan de em ji xwe re rê û çarenûsekî maqûl û hevpar bibînin. Hemî alîyên Kurd pêwîste ji refleksên îdeolojîkî û ji nêzîkatîyên wergitinî ku li ser dijminatîya hinek argumanan û olan pêkhatîye rizgar bibin û li gorî van refleksan tevnegerin. Kurd pêwîste ji du tiştên girîng dûr bisekinin. Yek antî semîtîzm e ya din jî refleksên îdeolojîkî û olîne. Ev herdu tişt jî xesarê didin Kurdan. Çarenûsa Kurdan di neo Osmanîya Tirkan de nîne. Çarenûsîya Kurdan di pêkhatina yekbûn û hevre sazkirinekî sazûmanîya cîvakî, netewî û dîrokî ya Kurd û Kurde. Paşê bi têkilî û hevkariyên aştiyane ên herêmêne. Kurd bi nav û hebûna xwe bi vê vîzyona ku jibo wan çarenûsa divê cihê xwe tekûz bikin.

Ez di vê bawerîyê de me. Hevkarî û tifaq bi hêzên derva re dibe lê bi hêzên dagirkerîn navxweyî re nabe. Em dikarin bi hêzên hejmonîk re lihev bikin lê em nikarin bi hêzên dagirkerên xwe re çarenûsîyekî daîmî û domandar çêbikin. Sedsal berê yê ku welatê me di nava xwe de parve kirin û vê daxwazê pêşnîyarê hêzên derva kirin û bi wan da qebûlkirin hêzên herêmî bû. Hêzên dervayî herêmê tenê ew daxwaz qebûl kirin. Daxwaz ya hêzên herêmê bû, erêkirin ji hezên hegemon bû. Îro jî heman tiştî dijî. Gelek tişt bi daxwaza hêzên herêmî ji hêla hêzên hegemonîk ve tên erêkirin. Divê em vê rastîyê baş bibînin.

Îro madem hêza me bi tena serê xwe nikare çarenûsa me tayîn bike, wê demê em jî dikarin bi yekîtî û yekrêzîya xwe daxwaza îstîkbala gel û welatê xwe pêşkêşî erêkirina hêzên hegemon bikin. Kîjan Kurd bawer dike ku ger li dijî hêzên hejmonî bi hêzên xwe yên dagirker re lihev bike wê sibê mafê wî yên netewî bê misogerkirin? Her Kurd divê vê pirsê durist ji xwe bipirse. Ez ti car bawer nakim ku bi lihevkirinekî wiha hêzên dagirker me û mafên me qebûl bikin. Sed sal berê çi qewimîbe wê dîsa heman tişt dubare bibe.

**Hesen Haranî**

# Ji Seqizê û Rojhilatê Kurdistanê ve ber bi cîhanê, Peyama Jin, Jiyan, Azadî



N. Sefiye Xalidî



Di 16ê Îlona 2022an de, Jina Emînî ya 22 salî, piştî ku ji aliyê hêza bi navê “polîsên exlaq” ve li Tehranê hatibû girtin, jiyana xwe ji dest da. Bi vî awayî, Jina – jineke ciwan a Kurd ji bajarê Seqizê bû pêşeng û hêmana tevgerekê ku dengvedana wê sînorên Kurdistan û Îranê derbas kirin.

Ji Kurdistanê dengê “Jin, Jiyan, Azadî” bilind bû. Tişta ku wekî bangeke nerazîbûnê dest pê kiribû, veguherî sembola têkoşîna ji bo rûmet, diyarkirina çarenûsê, wekhevî û azadiyê. Ev dirûşm li gelek deverên Îranê belav bû û ji aliyê mirovên ji pêkhateyên etnîkî û civakî yên cihêreng ve hate hembêzkirin.

Jîna Emînî ji bo kurdan xwedî girîngiyeke taybet e. Ew ne tenê jineke ciwan, lê herwisa kurdeke xelka Seqizê bû. Mirina wê di heman demê de gelek aliyên newekheviyê eşkere kirin: sînordariya li ser jinan, rewşa kêmîneyên etnîkî û tengkirina qada azadiyên kesane û siyasî.

Dirûşma “Jin, Jiyan, Azadî” van mijaran bi hev ve girê dide. Ev dirûşm vê yekê tîne bîra me ku azadî ne tenê tê wateya derbirîna daxwazên siyasî, lê herwisa mafê jiyana li gorî nasname, ziman û çanda xwe û diyarkirina rêça jiyana xwe ye.

Bi taybetî ji bo civaka Kurd, ev tevger peyameke girîng dide: divê daxwaza azadî û wekheviyê di nava civaka xwe bi xwe de jî bi awayekî cidî were girtin.
Ne bes e ku mirov ji bo Kurdistanê an jî ji bo civaka xwe daxwaza azadiyê bike, eger di heman demê de jin di nava malbat, civak an jî rêxistinên siyasî de xwedî derfet û mafên kêmtir bin.

Divê wekheviya zayendî nebe mijareke duyemîn ku tenê piştî pêkhatina guhertina siyasî tê nirxandin ew di jiyana rojane de dest pê dike, di nava malbatê de, di pêvajoya mezinbûn û perwerdehiyê de, li dibistanê, li cihê kar, di têkiliyan de û di beşdariya siyasî de.

Ji mirina Jînayê ve, hişmendiya derbarê mafên jinan li Îranê de guherînek berbiçav derbas kiriye. Di heman demê de, rêxistinên mafên mirovan ên navneteweyî berdewam dikin ku zextên girîng li ser jin û keçan, bi taybetî di derbarê pêçandina mecbûrî de, rapor bikin.

Rêxistina Efûyê ya Navneteweyî - di nav tedbîrên din de - girtin, dozên cezayî, desteserkirina wesayîtan, û sînordarkirinên li ser gihîştina perwerde û kar ji bo jinên ku van rêziknameyan binpê dikin belge kiriye.

Jinên Kurd ên ku di warê siyasî û civakî de çalak in jî berdewam dikin ku bi xetereyên girîng re rû bi rû bimînin. Dozên çalakvanên Kurd ên wekî Pexşan Ezîzî û Verîşe Moradî nîşan didin ku jinên ku helwest digirin û dengê xwe bilind dikin dikarin bi encamên giran re rû bi rû bimînin.

**Lewma, salvegera kuştina Jînayê divê ne tenê rojeke bîranînê, belku kêliyek be ji bo nirxandina kûr a li ser xwe. Divê Kurd ji xwe bipirsin ka dirûşma “Jin, Jiyan, Azadî” bi rastî ji bo civaka wan çi wateyê dide.**

Eger jin rûyê tevgereke azadiyê ne, divê ew di warê biryardanê, rêxistinên siyasî û avakirina pêşerojê de jî bi awayekî wekhev beşdar bibin. Divê dengê wan ne tenê dema ku ji bo xizmeta dozeke siyasî an neteweyî hewcedarî bi wan heye, were bihîstin.

Jin ne tenê sembolên tevgerekê ne, ew aktorên serbixwe ne ku dixwazin û divê pêşeroja xwe diyar bikin.Di heman demê de, girîng e ku ezmûnên cihêreng ên jinên Kurd werin xuyakirin. Dibe ku jineke Kurd di heman demê de rûbirûyî cudakariya li ser bingeha zayendê, dezavantajên etnîkî û zextên siyasî bibe.

Tam ji ber vê yekê, divê azadiya wê neyê tengkirin û tenê bi aliyekî ve neyê sînordarkirin. “Jin, Jiyan, Azadî” tê wê wateyê ku divê rêz li rûmet û azadiya jinê were girtin, bêyî ku li pozîsyona wê ya siyasî, olî an civakî were nêrîn.Ji ber vê yekê, divê Jîna Emînî ne tenê wekî sembola protestoyeke dîrokî were bibîranîn. Ew ciwanek, keçek, Kurdek û jinek bû ku xwediyê jiyan û hêviyên xwe yên taybet bû.

Îro, navê wê bûye nîşana tevgereke ku têkiliya di navbera mafên jinan, rûmeta mirovî, azadî û nasnameyê de derxistiye pêş û eşkere kiriye. Ev yek berpirsiyariyeke taybet dêxe ser milê Kurdistanê: divê bîranîna Jinayê ne tenê di çalakiyên bibîranînê û dirûşmeyan de bijî.

Divê ew di awayê rastîn ê muameleya li hember jinan, di çanda civakî û di pêkhateyên siyasî de jî xwe nîşan bide.Dibe ku peyama herî girîng a “Jin, Jiyan, Azadî”yê ev be: heger nîvê civakê ne azad be, azadî nikare temam be.

Pêşerojeke dadperwer ji bo Kurdistan û Îranê tenê wê demê dikare pêk were ku jin ne tenê wekî hilgirên sembol û kevneşopiyan, lê wekî mirovên xwedî maf, deng û bijardeyên xwe yên wekhev bên dîtin.
Jîna ji Seqizê hatibû, lê peyama wê li Kurdistanê sînordar nema. Ew veguherî bangekê ku dengê wê li derveyî sînorên etnîkî û erdnîgarî jî belav bû.
Ji bo Kurdan, ew herwisa bîranînek e ku divê mirov hem li derve û hem jî li hundir parastina azadiyê bike, ne tenê li hemberî zilmê, belku li hemberî pêkhateyên baviksalar û newekheviyên nava civaka xwe jî.

Ji ber vê yekê, divê “Jin” ne tenê navekî ji rabirdûyê be. Mîrateya wê li her derê dijî ku jin dikarin derbarê jiyan, beden, perwerde, evîn, kar, ziman û dengê xwe yê siyasî de bi serê xwe biryarê bidin. Wateya kûrtir a dirûşma “Jin, Jiyan, Azadî” jî tam li wê derê ye.Peyama ji bo nifşê ciwan ev e: Azadî, rûmet û dengê we, aîdî we ne, û pêşerojeke baştir li wê derê dest pê dike ku hûn bi biryardariya serbixwe, piştevaniyê û bêyî tirs, piştgiriya hev bikin.



# Binpêkariyên mafê mirovî li Kurdistanê

## Navê 4200 kes ji kuştiyên meha Befranbara 1404ê hate belavkirin



Saziya Mafên Mirovî ya Îranê li nûtirîn rapora xwe de navê zêdetir ji 4200 kes ji kuştiyên xwenîşandana heyva Beftranbara 1404 a rojî ku ji aliyê hêzên hov û tepeserkerên rêjîma Îranê ve hatine kuştin, belav kir û dazanîn ku %91 a wan kesan li 18 û 19ê Befranbarê de hatine kuştin.
Pêka vê amarê navê zêdetir ji 281 zarok û 420 jinan li lîstê wan kuştiyan de hatiye tomarkirin û zêdetir ji 3 hezar û 356 kes ji vê amarê, li 18 û 19ê Befranbarê de hatine kuştin.
Li raporê de hatiye: Ev amar ya bajarên 30 parêzgeh ji 31 parêzgahên Îranê, hatiye tomarkirin û pêka belge û şahidan, hejmareke gelek zêde ji wan kesan li encama teqeya rasterast a hêzên rêjîmê bi çekên şer hatine kuştinê.
Li vê raporê de îşare bi teqeya hêzên rêjîmê bi cihên hestiyar ên xwenîşanderan, teqe li kesên li halê revînê û bikaranîna nîşançiyan bo kuştina xelkê û kuştina kesên ku heta beşdarê xwenîşandanê jî nebûne hatiye kirin.
Vê saziya mafê mirovî daye zanîn ku bi sedema qutbûna înternet, givaşa bo ser malbatan û sînordarbûna destpêregihîştin bi zanyariyan, amara serast a kuştiyan zêdetir ji vê amara tomarkirî ye.

---

## Rêjîma Îranê girtiyekî din ê siyasî bi sûçê sîxurî bo Îsraîl bidar vekir



Dezgeha Dadwerî ya Komara Îslamî ya Îranê roja Şemî 28ê Xermananê ragihand ku cezaya darvekirina Hûsên Pedaran, li Îsfahanê ku di dosiyeya pêwendîdar bi şerê 12 rojî de hatibû binçavkirin, hat cîbicîkirin.
Navenda Ragihandina Dezgeha Dadweriya rejîmê îdia kiriye ku Hûsên Pedran zaniyariyên pêwendîdar bi cihên leşkerî yên hestiyar li parêzgeha Îsfahanê bo Saziya Mûsadê şandiye û bi tohmeta sîxurî û hevkariyên îtilatî bo Îsraîlê hatiye dadgehkirin û bi darvekirinê hatiye cezadan.
Dezgeha Dadwerî ya rejîmê hûrgiliyên li ser dema girtina Hûsên Pedran, belgeyên pêwendîdar bi wan tohmetên sepandî û ti raporek liderheq berevaniya parêzerê navbirî belav nekiriye.
Eva di demekê de ye ku cezayê darvekirinê yên pêwendîdar bi tohmetên ewlehî û sîxuriyê li dadgehên ku ji pîvanên dadweriyê dûr in, li pişt deriyên girtî û li ser bingeha îtirafên ku saziyên mafên mirovan gelek caran ragihandine ku di bin givaş û îşkenceyê de hatine wergirtin, tên sepandin û cîbicîkirin.

---

## Rêjîma Îranê li tepeseriya tevgera Jînayê de, cinayetên dijî mirovahiyê encam dane




Rêkxistina Lêborîna Navdewletî li çaremîn salvegera şehîdkirna Jîna Emînî de û li raporteke de ragehand, desthilatdarên Komara Îslamiya Îranê wek (bikerên Kuştarê) li rêya dariştina êrîşek sîstematîk bo ser xelkê medenî, tawan dij bi mirovahiyê encam daye.
Raporta 1148 rûperiya Lêbordina Navdewletî ku li jêr navê (Darêjerên Tawanê) li kongireya Rojnamewanî de li Lendenê perde li ser hate hildan, bi piştgirêdan bi lêkolîn li hezaran belgename û qisên 270 şahidhalan, eşkere dike ku hêzên ewlehî û serbaziyên rejîmê bi armanca siyasî, regezî, netewî û olî, dest dane kuştar, îşkence, destdirêjiya cinsî û bêserşûnkirna bizorê.
Egnis Kalamar, Sikirtêrê giştî ê rêkxiravê tekezî ji vê kir ku belge tu gumanekê nahêl in ku desthilatdarên Tehranê bo bêdengkirina dengê Azadîxiwazî, hawara xwe birine ber hêza kuştinê.
Li beşeke din a raportê de hatiye ku Komara Îslamî bi awayekî taybet û bi mebesta cudakariya Îtnîkî, serkuta xwînawî bi ser pêkhatên Kurd û belûç de sepandiye.
Belavkirina çekên giran û qinasê li parêzgehên Kurdistan, Kirmaşan û Urmiyê bo mînaka eşkere ya wan tawanan hatine hejmarkirin.
Lêborîna navdewletî navê 87 berpirsên pile bilind ên rejîmê, (ji wan fermandên sipaha pasdaran, Firaca û wezareta navxwe) eşkere kiriye ku dibe rûbirûyê lêpêçîna sizaya navdewletî bin.
Sikirtêrê giştî ê Lêborîna Navdewletî hoşdarî da ku berdewamiya wan tawanan encama (Derbazbûn li sizaya ne) û daxwaz li civatgeha giştî a rêkxirava neteweyên yekgirtî û dadwerên seranserê cîhanê kir ku dadgeha taybet a navdewletî pêkbîn in û fermana girtinê bo tohmetbarên kuştarên Îranê der bikin.

# Agirî

◆ Rojnameya “Agirî” di van malperên jêrên de bixwînin:
◆ www.Kurdistanmedia.com
◆ www.Agirimedia.org
◆ rojnamaagiri@gmail.com
◆ www.facebook.com/Agirikirmanji

Navnîşana derveyî welat: AFKB.P. 102- 75623 ParisCEDEX 13 –FRANCE E - Mail: Agiri2003@gmail.com Hejmar (526)

